


zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal: 1982

hejmar: 7

ÇIVROKA ROVİ


Rovî çûbû der ku ji xwe re li xwarinê bigere. Ew hat û gîhişt xaniye-Kî. Li ber xêni dîkekî li ser darekê danî bû. Rovî ji dîk pîrsî:

- Tu bi xêra xwe nikarî çend çêlan bide min ku ez bikarim wan bixwim ?

Dîk got:

- Belê ez ê çend çêlan bi dîm te, lê tu here bi xwe wan bigire. Ew di wê goma ber darê dane.

Rovî bi hêla gomê da çû û hustiyê xwe kir gomê. Lê di gomê da seyekî xwe vezilandibû. Wî serê xwe rakir û dest bi ewitandinê kir. Rovî tirsîya û ji wê derê bi bazdanî dûr ket.



Rovî destvala hat û gîhfît ber çemekî. Li ber çêm wi qanzek tev çê – leyêñ xwe dît. Rovî ji qanzê pirsî:

- Dêya rindik, tu nikarı çend çêleyêñ xwe bide min ku ez bikarim bixwim ?

Qanzê got:


- Belê ! Ez ê çend heban bidim te lê ez pêşfîyê wan ji te re bişom û paqîj bikim.

Qanzê çêleyêñ xwe da dora xwe û ajnê kir, çû cîhekî kûr sekini.

Paştre deng li rovî kir:

- De tu mîre , were bi xwe çêlan ji xwe re biniqinî !

Rovî zanfbû ku çêle ji dest çûn, enîya xwe xurand û ji wê derê çû.



Rovî vê cara destvala hat û gîhîst mîrgekê. Dît ku li mîrgê mehinek tev caniyê xwe diçêrin. Ew hat cem wan û ji mehinê pîrsî:

– Mehîna delal , tu xêra xwe re nikarî caniyê xwe bide min ku ez wi bixwim ?


Mehînê got:

– Belê ! Ez ê caniyê xwe bidim te, lê ez pêşiyê dixwazim ku tu li bin nahlê binê lingê min mîzeke hela çi li ser nîvîsandî ye ?


Rovî got:

– Belê tu çer dibêjî ez ê wer bikim.

Hespê lingê xwe hinekî bilind kir ku rovî bikaribe lê mizebike. Rovî nêzîkî lingê hespê bû û dest pê kir ku bixwîne lê nedî çi lê qewimî hespê pînek di eniya wî de lixitibû.



XWE BAŞ VEŞARTIYE



Heger tu wan malikên bi deq reng bike tu ê
zanîbe ku ci heywan bi bazdan tê

ÎVANA MEYMÛNÊ

Du pisikan seriyek penêr ji bajêr dizfbûn. Wan nizanîbûn wî penêrî çawa li hev parve bikin. Pisikan penêrê xwe hildan û çûn cem meymûnê. Hêvî jê kirin ku ew penêr parve bike. Meymûn di dilê xwe da pir şâ bû. Wê qest penêr kir du parce: yekî mezin û yekî piçûk. Herdu parce danîn ser mêtênenê û kişand. Meymûnê dít ku yek girane, rahişt parce mezin gepik jê xwar û carek din danî ser mêtênenê û kişand. Vê carê jî parceyê din giran derket. Meymûnê ji wî parceyî ji gepek xwar.

Pisikan bala xwe danê ku meymûnê pê ketiye wê gişkî bixwe, jê re gotin:

– Em te ra gelekî spas dikin, her çi maye bide me em ê bi xwe nav hev da parve bikin.

Meymûnê got:

– Lê ez axmaxê we me ? Min sibe zûda karûbarê xwe hiştiye ji we ra penêr nîvî dikim. De zû ji ber çavên min herin, ew penêrê ku maye ji heqê min e.

Pisikan patka stûyê xwe xu'rândin û pol-poşman vergeriyan.

Temûrê Xelîl



Andante

Ley . lê, Ley . lê,
Ley . lê xâ , nê,

Ley . lê, Ley . lê,
ko . çer ca . nê.

LEYLÊ

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Leylê, Leylê, koçer canê,

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Leylê, Leylê, koçer canê.

Malka Leyla min giran e,

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Malka leyla min giran e,

Leylê, Leylê, koçer canê.

Bar kir barê heft devan e,

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Bar kir barê heft devan e,

Leylê, Leylê, koçer canê.

Deve çûne lo, kudik mane,

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Deve çûne lo, kudik mane,

Leylê, Leylê, koçer canê.

Şerê devan lo, şerê devan,

Leylê, leyлê, Leylê xanê,

Şerê devan lo, şerê devan,

Leylê, Leylê, Leylê canê.

Şerê devan lo, ser kudikan e,

Leylê, Leylê, Leylê xanê,

Şerê devan lo, ser kudikan e,

Leylê, Leylê, Leylê canê.

LÊ GERİN

Gelo tu dikarî pêyvêن ku li hevdu têن (girê dayına wan bi hevre heye) bibinî.Rêzek ji sê pêyvêن kurdî pêk hafiye.Ji wan sê peyvan didu li hevdu tên.ya din nayê.

bri	pêçî	bijang
lêv	sol	diran
xani	deşt	çiya
pisik	qelûn	küçik
hîv	mirîşk	kew
histêwrik	êzing	dar
por	kevir	serî
nexwes	berf	zivistan
dê	zaro	kursî
nîvan	dapîr	bapîr
berk	karik	mîh
payîz	şapik	havîn
mamoste	nexwes	ambûlans
bajar	dengbêj	klam
genim	ard	xweli
hesin	gur	rovi
şev	şiv	tari
şêr	pisik	piling
kavir	he:sp	baran
zer	ewr	sor

SERÍ GUHERTIN



Serê wan heywanên jorin bi hevre hatine
guhertinê. Gelo kîjan serî yê kîjan heywaniye ?

ZAROKE MİN

Zarokê min
kelatiya hinavê t min
ronahiya do çavê t min
xwîna germ giyanê min
zarokê min, zarokê min

to pişkuja baxçe minî
dirêjiya jiyê minî
to tepena dilê mimî
xem revîna kulê t minî
zarokê min , zarokê min

to rastina hebiya min
to heviya paşt rojê t min
to şiyân û evina min
to jivan û zinara min
ko mezin bi zarokê min
zarokê min, zarokê min

welatê xo li bîr nake
day û baba sexbêr bike
çakiya wan paşçav bike
hêviya wan lê tal neke
zarokê min, zarokê min

to peyda bî bi azadî
ji bîr neke ko mezin bî
azadiya gelê kurdî
cuwaniya ewî erdî
zarokê min, zarokê min

BENGİN

BİZİNEN SORO

Hebû tunebû lawikek hebû, navê wî Soro bû. Sê bizinê n wî hebûn. Ew her roj danê sibehan tev bizinan diçû derê gûnd ku wan biçêrîne. Rojekê Soro westiyabû û xeva wî dihat. Li bin siya darekê palda û raket. Wexta ew raket bizinê n wî bazdan û çûn ketin zeviyek genim. Dema ew hişar bû dît ku her sê bizimê n wî ketine zeviyê û gênim di-xwin. Soro pêşiyê ban wana kir, paşt re jî çoyê xwe girt û bidû wana bazda, xwast wan ji zeviyê derxîne. Gelek li berda lê şe nekir wan ji zeviyê derxîne. Bizinan ji ber wî bazdan û ew westiya. Ji westandinê xwe da erdê û dest bi gîrfnê kir. Wê çaxê Kêrgûya Belek hat cem wî û pirsî:



— Soro tu çima digire ?

Soro:

— Bizinê min ketine zeviya xelkê û genimê wan dixwin û min şe ne—
kir bizinan ji zeviyê derxînim. Ez ji bo wê digirim.

Kêrgûya Belek:

— Ez ji bizinan natirsim. Ez ê alîkariya te bikim û wana ji te ra ji ze—
viyê derxînim.

Gêrgûya Belek xwast bizinan ji zeviyê derxîne, wê hinekî cat kir lê
bizinan xwe nedan dest, ji ber reviyan. Mêze kir ku ew jî nikare
bizinan derxîne, wê jî xwe da erdê û dest bi gîriyan kir.

Wê çaxê Roviye hat û ji Kêrgûya Belek pirsî:

- Kêrgûya Belek tu çima digire ?

Wê got:

— Ez digirim ji bo ku Soro digire.

Rovî pirsî:


— Soro ji bo çi digire ?

Kêrgûya Belek:

— Soro digire ji bo ku wî şe nekir bizinê xwe ji zeviyê derxîne.

Rovî got:

— Ez ê wan ji zeviyê derxînim. Min pir caran bixin ji zeviyan der—
xistine.



Paştre wî bazda û çû ber zeviyê ku bizinan jê derxîne. Lê bizin ji ber wî jî reviyan û xwe nedan dest. Wî gelek wext lê da lê şe nekir ku wan ji zeviyê derxîne. Ji bazdanê ew jî pir westiya û xwe da erdê, dest bi gîrmê kir.

Wê çaxê Moza Deqî hat û ji rovî pirsî:

– Rovî, tu çima li vê dera rûniştî û digîre ?

Rovî hal-hawal ji Moza Deqî re got.

– Ez digîrim ji bo ku Kêrgûya Belek digîre, ew jî digîre ji bo ku Soro digîre. Soro jî ji bo ku bizinêñ wî ketine zeviya xelkê û gênim di—xwîn digîre.

Mozê got:


– Hûn hemûji bo bizinan digîrin ? Min got kanê çi qewîmiye ? Ez ê bizinan ji we re ji zeviyê derxînim. Ez bi xwe caran ji bizinan natırsim. Rovî li Mozê vegerandî:

– Vêca tu Moza ku hewqas piçûke, çer bikarî sê bizinan re baş bike ? Em sê kesêñ hewqas mezin; şe nekir wan ji zeviyê derxine !

Mozê got:

– Bizin ji min dibizdin û paştre wê fîrda çû li ser pişta bizinekê danî. Derziya xwe her çi qas ji dest hat weqas tê de çekand. Bizinê, rebenê ji janê û tîrsê tûlda û ji zeviyê derket, ber bi gund bazda. Herdu bizinêñ din jî, ji tîrsê bi dû ya din bazdan.

Wexta bizin bazdan û ji zeviyê derketin, Soro dest ji girinê berda. Wê çaxê Kêrgûya Belek û Rovî jî dest ji gîrînê berdan.



FEQÎ Û KERÊ XWE

Feqî ji kerê xwe ce got:

- Kero beytil himar, (Kero ji mala keran)
ji şeveq ve çûyiî, hîn nu tê mal.

Kerê got:


- Feqî bi wî xalîqî ez dihatim mal,
bi rê de qîvarekî elo eyşanî kete
pêşıya min hêdî, hêdî
nazik, nazik ew çinî û xwar
li min bû êvar

Feqî got:


- Kero bi wî xalîqî,
ez ê herim Mêrdînê, bînim şûjina çavşînê
têxim navbera kurtan û xwînê

Kerê got:

- Feqî bi wî xalîqî ku tu herî Mêrdînê
bîne şûjina çavşînê
têxe navbera kurtan û xwînê
waye min şixreyek aniye wê,
yek bimîne serê payîz û havînê



GULEK XWEŞIK



Van deqan bigîhîne hev û reng bike
ku gul xweşiktir xwiya be.

KALO DİBAN

Ez çûm mala Kalo Dîban
Wi ji min re çîvrok got
Li ser jînê, ser mîrovan
Dil û ceger li min sot

Kalo Dîban bi emir e
Belkê zêdeyî heyştê
Di dest wî de timî gopal
Piştek spî li pistê

Ez tim diçim mala wan
Li min şîretan dike
Piri baş e Kalo Dîban
Ew ji min pir hez dike

Firat Cewerî


KEÇELONEK


Hebû tunebû pîrek hebû. Ji lawikî wê pêva keskî wê tunebû. Halê wan pir nexweş bû. Pîr feqîr bûn û ji kerekî wan pêva tiştekî wan tunebû. Rojekê pîrê ji lawê xwe re got:

— Lawo here bajêr û wî kerê me ji me re bifroşe û ji me re hinek he-law bikire û werîn mal.

Navê lawê pîrê Keçelonek bû, ji ber ku por bi serê wî ve tunebû.

Keçelonek ker da ber xwe û çû bajêr ku wî bifroşe. Di wî bajarî de sê xaponek hebûn ku xelk dixapandin. Yekî ji wan li serê bajêr yê duduyan li nava bajêr û yê sisiyan jî lî seriyê din yê bajêr disekeinîn. Keçelonek kerê wî li ber hat bajêr. Xaponekê ewil hat pêşiyê û jê pirsî:





Wê got:

– Erê ew wîlo ye!

Keçelonek got:

– Baş e, divê ez heyfa xwe ji wan hilfinim.

Roja din ew çû nav gund û kerekî pişturmî kirî û sê mecidî xist – in paşıya kerê, tev wî çû bajêr. Li bajêr xaponekê ewil hat pê şiya wî û jê pirsî:

– Kerê te bi çiqasî ye ?

Keçelonek got:

– Bi bîst mecidîyan !

Xaponek xwast ku bi pênc mecidîyan bikire lê Keçelonek razî nebû. Paştre Keçelonek tev kerê xwe bi rê ket û carekê bi çoyê xwe li kerê xist. Çaxa wî li kerê xist, zêr ji dawiya kerê pengizîn û li erdê ketin. Yê xaponek mîzekir ku ker ewe zêran dike. Heyîrî ma. Bi lez bazda çû cem hevalê n xwe yê n din û hal-mesele ji wan re got.

– Ew kerê te bi çiqasî ye ? Ez ê wî ji te bikirim.

Kêfa Keçelonek hat û got:

– Kerê min bi deh mecidiyane !

Yê xaponek got:

– Na welle ez ê pênc mecidiyen bidim te.

Keçelonek got:

– Ez wilo nadim û bi rê ket çû nava bajêr.

Di nava bajêr de xaponekê duduyan hat pêşıya wî û jê pirsî:

– Kerê te bi çiqasî ye ?

Keçelonek got:

– Kerê min bi deh mecidiyen e.

Yê xaponek got :

– Na welle ez ê çar mecidiyen bidim te.

Keçelonek ew jî qebûl nekir û bi rê ket hat dawiya bajêr. Li wê derê xaponekê sisiyan hat cem û jê pirsî:

– Ma kerê te bi çiqasî ye ?

Keçelonek got:

– Bi deh mecidiyen.

Yê xaponek jê re got:

– Ez ê sê mecidiyen bidim te.

Keçelonek dît ku kerê wî her tere erzan dibe, mecbûrma ku wî bi sê mecidiyen bide.

Wî bi wan sê mecidiyen helaw kirî. Hingî birçî bibû, ew helawa xwar û destvala hat malê , bi ser diya xwe ya pîr de.

Diya wî dît ku lawê wê destvala hat malê . Pîrê ji lawê xwe pirsî:

– Lawê min tu çima destvala tê malê ?

Keçelonek mesela xwe û yê n xaponek ji diya xwe ya pîr re got.

Pîrê got:

– Lawê min ew her sê kesana, xaponekê n bajêrin. Wan tu xapan-dine.

Keçelonek got:

– Wilo ye ?

Keçelonek da rê, hat nav bajêr. Her sê xaponek hatin cem wî. Keçe—lonek çoyekî din li kerê da û zêr jê pengizîn û li erdê ketên. Her sê xaponek ecêb mayî man. Ji hev re gotin :

— Ew kera bi çiqas pere bi jî em ê wî bikirin. Paştre ji Keçelonek pîrsîn:

— Ma kerê te bi çiqas pere ye?

Keçelonek got:kerê min bi elbek zêre.

Xaponekan gotin:

— Baş e! Em ê wî ji te dikirin. Hanîn elbik zêr dan Keçelonek û ker girtin. Keçelonek marîfeta kerê ji wan re got:

— Divê hûn wî kerê xwe têkin odekê û doşengekê bidin bini. Xwarin û wexwarina wî jî elbek ceh û av e. Ku hûn baş qayîti kerê xwe nebin ew ji we re zêran nake.

Xaponekan; kîfa wan pir xweş bû. Bi lez çûn û ji kerê re doşengek kirîn û ew kirin odekek paqîj. Ker li ser danîn û elbek ceh, elbek jî av dan ber wê.

Keçelonek bi zêrên xwe çû mal û demek şûnda bi zêrên xwe ji xwe re dawet kir û zewicî.

Rojekê ji rojan xaponekê mezin ji hevalêن xwe yêن din re dibêje:

— De rabin em herin û li kerê xwe mîzekin! Ka erd tijî zêre ? Kî ci zanî ku ew di nav zêranda nefetisî be.

Her sisîyan dan rê û hatin cem kerê xwe. Li ber dêrî sekinin û hingî kîfxweş bûna bala xwe nedan bîna rêxê ku ji oda kerê dihat. Wan got kanê ew bîna aha bîna zêrane. Ji bo wê yekê ew bîna pir li xweşa wan çû. Wan hêdîka li dêrî xistin û ker ziriya. Yekîji wana got :

— Guhdarî bikin wî hewqas zêr kirine ku ew ê tê de bifetise ! Werin em herin û zêrên xwe bînin.

Ji hev re derî vekirin û li kerê mîze kirin. Lî li ci mîzekin:

oda kerê tijî rêx e û ker nîvmirî tê de mexel e. Wan fam kirin ku ew hatine xapandinê. Tevhev qîsekirin û xwastin ku heyfa xwe ji Keçelonek bistînin.

Keçelonek zanîbû ku ê xaponek bêñ mala wî ji bo wê yekê wî tev jina xwe qise kir û paştre jê re got:

—Çaxa yêñ xaponek têñ vira ez ê mirîşkekê serjê kim û eyarê wê tijî xwîna wê bikim û têxim nav laşê te. Bidûre ez ê bi xençerê li wî eyarê mirîşkê xînim, tu jî xwe bavêje erdê û ez ê rajem bilûrê û tu rabe li ber me govendê bîgire !

Yêñ xaponek hatêñ mala Keçelonek û gotin:

— Lo lo lo..... tu ê kuda herî ?

Keçelonek ji wan re got:

— Keremkin û rûnin. Em ê pê şiyê qahwe vexwin piştre hûn ci dixwazin wî bikin !

Yêñ xaponek hatin û rûniştîn . Jina Keçelonek qahwe keland û da nîvanêñ xwe lê qahwepir tahl çêkiribû. Keçelonek qazîve rahişt xençerê û di laşê jina xwe de lê xist. Xwîn ji laşê wê herîkî, ew li erdê geviziya , qazîve xwe wek miriyan dirêj kir.

Yêñ xaponek heyîri man:

— Kuro te çîma jina xwe kuşt ?

Keçelonek:

— Min jina xwe kuşt lê ez dikarim wê xweş bikim. Paştre rahişt bilûrê û li xist. Jina wî rabû ser lingan û dest bi govendê kir. Xaponekan:cav-ên wan fireh bûn li hevdu mîze kirin:

— Welle em wê bilûrê ji wî bikirin ! Ew bi sêhêrê ye.

Ji Keçelonek pirsîn:

— Ma tu vê bilûra xwe nafroşe me?

Keçelonek got:

— Ew bilûra min bi sêhêrê ye, ne ji bo xatirê we bûna min nedida we lê ji bona we ez ê bilûrê bi du elb zêran bifroşîm we!

Xaponekan bilûr bi du elb zêr xiriyan û çûn malêñ xwe. Roja ewil xaponekê mezêñ bilûr ji xwe re bir malê . Wê şevê li mal herdu singêñ xwe li ser hev dirêj kiribûn: deng li jina xwe kir:

— Keçê rabe bi lez ji min re qahwekê çê bike ! Hîna jînê qahwe çê-nekiribû wî wê cara jî , jêra got ku ew goşt û birincê bikelîme.

Jînê xwe xeyfandû got:

– Bela pê şiyê qahwe çê bibe û ez paştre goştû birincê bikelînim.
Mêrik li mahneyekê digeriya rabû , rahişt xençerê û jina xwe da ber
xençeran. Bidûre dest avê t bişûrê û li xist. Lê jînik ranebû pê.
Herdu xaponekêñ din jî bîlûr cêribandin lê tiştek ji fam nekirin. Vê
cara jî gîltîstîn wê qanaetê ku Keçelonek ew xapandin e. Bi lez mala
Keçelonek girtin. Keçelonek zanîbû ku ew werin mala wi, ji bo wê
yekê, wî berê tev jina xwe qise kiribû û ji wê re gotûbû:

– Em ê biçin nêçirê. Tu ji me re xwarin û vexwarinê hazir bike!
Xaponekan gotin:

– Lo lo lo ma tu vê cara karibe ji dest me bifili te.

Keçelonek got:

– Werin em herin nêçirê pêşiyê. Hûn dikarin heyfa xwe li min li nê –
çirê bigirin.

Li hevdu hatin ku biçin nêçirê. Keçelonek li malê du keroşkêñ wî
hebûn. Ji wan yek ji xwe re girtû bir nêçirê. Ew danê nîvrojê pir bir –
çî bîbû. Ji keroşka xwe re got:

– Her ji jina min re bibêje bila tev xwarinê vere. Em pir birçî bûne.
Wî keroşk berda û ew reviya ji wê derê dûr ket.



Demek şûnda jina Keçelonek tev xwarinê û keroşka din hat cem nê – çîrvanan. Yêن xaponek dîsa heyîri man û devê wan ji hevdu çû. Wan gotin:

– Kuro va keroşka te meriyan fam dike.

Keçelonek got:

– Keroşka min wek meriyane ! Merî jê re çi bibêje, ew ê wer bike !

Xaponekan pirsin:

– Ma tu wê nafroşe me ?

Keçelonek got:

– Ez ê wê ji bo xatirê we bi nîvelb zêr . bidim we.

Wan keroşk ji Keçelonek kirfn û çûn mal. Roja din çûn nêçîrê , keroşk ji tev xwe bri'bûn. Wexta ew bîrcî bûn, yê mezin keroşkêra got:

– Here malê û ji diya min re bibêje ku ew mera xwarinê û vexwarinê hazir ke bîne vê dera.

Piştara wî keroşk berda û ew reviya û çû ji wê derê dûr ket.

Gelek wext derbazbû lê diya xaponekê mezin tev xwarinê nehat. Hin-ek wextê din derbaz bû wê çaxê xaponekê mezin got:

– Ma diya min çîma xwarin nehanî. Werin em herin û bipirsin.

Tev hevrabûn û çûn malê ku ji diya yê mezin bipirsin. Wexta ew ha-tn gîhiştinmal, yê mezin ji diya xwe pirsî:

– Dayê ma keroşkê te re negot ku tu xwarinê ji me re bîne nêçîrê .

Diya wî got:

– Lawê min wele min tu keroşk nedîye. Ez nizanim keroşka we kuda çûye ?

Xaponekan fam kirin ku Keçelonek ew dîsa xapandine.

Keçelonek zanfbû ku yêن xaponek bî ser wî de carek dîn werin, ji bo wê yekê xwe kiribû tabûtekê û piştre jina xwe şandibû ser yêن xaponek. Jina Keçelonek gîri hat cem yêن xaponek û ji wan re got:

– Birayê we yê Keçelonek li ber mirinê ye. Ew nexweş e. Xwe kiriye tabûtê û li ber xwe didi. Hinik maye ku ew bimre. Ew dixwaze ku hûn werin cem wî û lê helal bikin.

Guneyê wan bi jina Keçelonek hat û tevhev rabûn û çûn cem Keçelonek ku ji wî helaliyê bixwazin. Ew çûn ser tabûtê. Qulikek li ser tabûtê hebû. Yêن xaponek serê xwe kirin qulikê û ji Keçelonek helalî xwastin. Paştre çûn malêن xwe. Wexta çûn mal, Keçelonek ji tabûtê derket gelek kêfxweş bû ku ji derdê xaponekan filitibû.

PEYVEN BERVAJÎYEN HEV

berjor	berjêr
xweşik	nexweşik
bej	avî
berî	kedî
biha	erzan
paqîj	qilê rî
şuştî	neşuştî
zûha	şîl
hebûn	tunebûn
kûr	tenik
hûr	gir
ava kirin	xirab kirin
rakirin	danîn
tengası	firê qet
por kirin	aşkere kirin
bi fesal	bê fesal
tenê	bi hevre
li gel	li dijîf
pê şî	paşî
serjêr	serjor
bi dil	bê dil
sivik	giran
sist	şidandîf
baş	pîs
sivik	giran

NAZİM HİKMET

Ji zarokan ra


De rabin em zeviyê pê şkeşî zarokan 'kin
ema bila ji bo ka ta yek roj be,
wekî gogekî rengrengî diyarî ' kin
ta pê bilîzin
di nav istêrkan da bistirê n çawa dixwazin,

De rabin em zeviyê pê şkeşî zarokan 'kin
wek sêvek mezin diyarî wan ' kin
wekî nanekî germ
ji bo bixwin ta têrbîn
ema bila ji bo yek roj be.

De rabin em zeviyê pê şkeşî zarokan ' kin
ji nav destê n me wê bibin
û di nav wê da darê n nemirî biçînin
ta zevî tamê bawerkirinê nasbike
ema bila ji bo yek roj be



Werger: Kurdux

KÊRGÛ Ù GIZÊR



Tu dikare rê rayê kêrgûyê bide ku ew xwe
bigîhîne gizêrê

KAÇEPIRS




(14)



(8)


			N		
1			E		
2			C		
3			I		
4			R		
5			V		
6			A		
7			N		
8			G		
9			Ü		
10			N		
11			E		
12			G		
13			I		
14			R		
15			E		
16					



(13)



ETAR



Etarek çû gundekî ku tiştên xwe bifroşe. Ew gelek birçî bibû ji bo wê çû mal ekê. Li ber malê lawikekî piçûk ji xwe re dîfşt. Wî ji lê wik pîrsî:

-Mala we de pariyek xwarin tune, ku hun bidin min? Lawik bê deng çû hundirê malê û paşt re bi tasek dimsû hinek nanê sêlê vege-riya hat cem etêr. Wî dimsû nanê sêlê xwarû xilas kir lê pê têr nebû.

Etêr carek din ji lê wik pîrsî:

-Ez bi wî têr nebûm! Tu nikarî tasek dimsê din tev nanê sêlê bide min?

Lawik dîsa bê deng çû malê û paşt re bi tasek dimsû hinek nanê sê-lê ve vegerî û hat cem etêr.Etêr xwarina xwe xwar û vê cara pê têr bû.Berê xwe da lêwik û jê re got:

-Lawê min rehme li hestiyê dê û bavê te be !Ma dimsa we pir e ku te ji min re du tas anî?

Lêwik got:

-Erê xalo!Dimsa me pir e!Ew dimsa ku min'te re anî ya sala çûne, mişk ketibûnê ji bo wê yekê em wê didin xerfban ku zu xilas be! Etêr li ser gotina lêwik,rabû tasa dimsê li erdê xist û pin kir.Lêwik ji dest bi gazînê kir û giriya.Dengêlêwik çû dlya lêwik.Ew di gaziya lawê xwe de hat.Diyê jê pirsî:

-Lawê min tu çîma digire?

-Dayê wî etarî tasa avê ya seyê me li erdê xist û kûpand.

HESO

Rojekê Heso rahişte tûrikê xwe hink nan, gwîz û mewij xistinê û avite milê xwe. Sewlaqê xwe tijî av kir û bi milê xwe ve kir. Dûrbîna xwe kire stûyê xwe û berê xwe da çolê ku hinekî bêhna xwe derxîne. Heso di penav û newalanda geriya. Yek caran dûrbina xwe dida ber çavên xwe û li dora xwe meyze dikir.

Ro hatibû nîvroat. Gava ku Heso cara dawîn li dûrbîna xwe nerî, dît ku darek spehî qedere nî saetê dûrî wî ye. Heso xwe rast li darê girt ku li ber siya wê hinek bêhna xwe veke û pariyek nan û av bixwe. Heso nêzîk darê bû, ku ci bibîne. Ker û bergîl li bin darê mexelin, li bin darê miz û rêx kirine. Heso gelekî qehirî û bi vê şarê avêt ser darê :

Çi darek spehî ye
Tu xwedî çav gulî ye
Gulîk sêv û yek hincas
Yek xox yek teraqî ye

Pelê n te yê n şîn û geş
Dikin ba xweşînek xweş
Gava min halê te dît
Janê da kezeba reş

Ew fêkiyê n te yê n xweş
Îro dixwin ker û dehş
Soza mî ran ji te re
Te distînim bi zor yan xweş

Dil qewîne ji risas;,
Tu mîrekî pir mîrxas;
Were min bi himîne;
Fêkî tevde ji te re dimîne;

TEYREK



Van deqêñ ji yekê (1) heyan çelûpêncan (45)
bigîhiñe hevdu ka çi derkeve ?

HİNBUÑA NIVİSANDINA HEJMARAN

Li jêr, li hêla çepê ji yekê heta dehan
(I,IO)û li hêla rastê jî nivîsandina wan
hejmaran hatiye nivîsandinê. Lê ew nivîsandina
tev li hev in. Gelo tu dikare wan bixwîne
û nivîsandina hejmaran li himber wan wek
ku hejmara yekê hatiye çêkîrinê, binivîsîne?

I	<u>yek</u>	deh
2	_____	heft
3	_____	şes
4	_____	pênc
5	_____	<u>yek</u>
6	_____	sisê
7	_____	neh
8	_____	heyşt
9	_____	çar
IO	_____	dudu

HESIN HESIN

* SÊRÊ SERÊN GIYAN * H. BATTI-

Şaxê ku hesin hinet eşker
dîtin, di şikefta xwe revîya



...Eşker jî bi wê rixê de
dîtin.



Hesin bi rêde ligayî du
kesen bi qek dibe.



Ew kes ji hesin hinet
Pirsan dikin.





Meyzê! Meyzê!
Vane esker
hatin



Her yekî ji wan xwe dan
ber tahtekê û karê xwe
li ser kirin.



Gaxê esker nêzik bûn,
firarê me tiving li wan
regandin.



ser xurt bû, bû teqe
rega tivingan...




gend esker hatin kustin
a yen din reviyan.



Firaran çekên eskerên
mirî dirin û bi rixa xwe
de qûn...




Bersiva xəçepirsa hejmara 6.



Bersivêñ mijûliyêñ hejmara 6.

6	7	2
1	5	9
8	3	4



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANE

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA